

## Hizrên bê hempa yên Qasimlo

Hizrên modern û pêşkevtî û serdemiyane, bêguman bi wan hizr û ramiyariyane re dibêjin ku gorî jiyan û civak û siyaset û deshilatên îroyîn li cîhanê de dikare hemî aliyên jiyana civatgehê û mirovan berçav bigire, dikare wekheviyê dabîn bike, dikare demokrasiya rastîn dabinê, dikare dadperweriya civakî û qatî û .......

Dom»R:2





## Şehîd Qasimloyê, Ku Min Naskir

Ez dixwazim di vê nivisarê xwe da behsa Qasimloyê mirov û Qasimloyê siyasetmedar û qasimloyê, ku min naskiriye û dersên, ku ez ji xebata wî fêr bûme, bikim. Min navê Qasimloyê nemir di salen 70'î de bihîst. Hingê li Bakurê Kurdistanê hişyariyekê netewî ya berfireh di nava xortên Kurdan de hebû. Di behs û gengeşiya me de navê Qasımlo jî dihat gotin. Lê bi nêzîkî di salen 80'î de min ew naskir.......

Dom» R:8


*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (498) 22-07-2025 Buha (1000) Tûmen*





## Qasimlo rêberek ji bo hemû nifşan

Di dîroka neteweyan de, kêliyên biryardar hene ku rêça neteweyek bi dehsalan diyar dikin. Ev kêlî pir caran bi derketina holê ya rêberên ku ji rewşa heyî wêdetir difikirin û bi nêrînek pêşerojê, hewl didin ku civaka xwe ji şikestinên dîrokî û zordariya avahîsaziyê ber bi perspektîfên geştir ve bibin, re tîne. Dr. Abdolrehman Qasimlo, Sekreterê Giştî yê berê yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, yek ji van rêberan e. Kesayetiyek ku ne tenê di nav neteweya Kurd de, lê di heman demê de di asta herêmî û .........

Dom» R:5

# Peyama Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 36emîn salvegera terorkirin a "Dr. Qasimlo"




**Qasimlo li rêbaza xwe de zindî ye**

**Xelkê mafxwazê Kurdistanê!**

**Rêvîngên rêbaza "Dr. Qasimlo"!**

22ê Pûşperê, 36 sal bi ser terorkirina rêberê navdarê Kurd û Sekreterê vê demê yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê Dr. Ebdulrehman Qasimlo û hevalên vî li bajarê Viyenê, derbas dibe.

"Dr. Qasimlo" ku li vê rojê de digel Ebdulla Qadirîazer, endamê Komîteya Navendiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û Dr. Fazil Resûl, kesayetiyê xelkê Başûrê Kurdistanê û dostê Hizba Dêmokrat, bi armanca çareserkirina pirsa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê digel şanda komara îslamiya Îranê çone ser masê danûstandinê, ji aliyê desteya binav danûstankarê komara îslamî ve kevtine ber desrêjiya gulleyaê û her li wir canê paqijê xwe fidayê doza rizgariya gelê xwe kirin.

Terorkirina Dr. Qasimlo, yek ji bîranînên tal û ji wan karesatane ye ku bi ser tevgera Kurd û Hizba Dêmokratê de hatiye û komara îslamiya Îranê jî bi nasînek ku ji kesayetiya bilind a siyasiya Dr. Qasimlo û rola wî li meydana siyasiya Îranê û tevgera Kurdistanê de hebû, wa hesibandibûn ku bi terorkirina wî rêberê zana, tevgera Kurdistanê dê rastî şikestek mezin û Hizba Dêmokrat jî li meydana xebatê de bêhêz bikin. Tevî ku mixabin ew li terorkirina Dr. Qasimlo de bi ser kevtin lê nekarîn bigihîjin armancên xwe ku armanca vê terorkirinê bû, çimkî kar û hizra Dr. Qasimli bi curek li nav Hizba Dêmokrat de rehên vê belav bûye ku piştî vê karesatê jî Hizba Qasimlo karî qahîm li meydana xebatê de bimîne û îro tê dîtin ku Hizba Dêmokra a Kurdistaana Îranê, Karlêkertirîn û xwedî bandortirîn Hizba Kurdistanê ye 'û li hemû hilkeftên netewî yên Rojhilatê Kurdistanê de bi hezaran keç û kurên Kurd, bi hev re û bi dengê bilind, dirûşma "Qasimlo Qasimlo rêbaza te berdewam e" didin. Niha li hemû demekê zêdetir ew hizra netewî û mirovîyên ku Dr. Qasimlo li pêxemê de hate terorkirin, li rewşa geşekirinê de ye û Kurdiostan li asteke bilind a hişyariya netewî de ye û roj bi roj, berfirehtir dibe. Ji aliyê din ve, îro hemû bi çavên xwe dibînin ku rêjîma terorîstperwer a komara îslamiya Îranê ji her demekê zêdetir li asta navxweyî û navnetewî de rezîl bûye û guloka herifîna vê ketiya pênişîviyê, ewane hemî jî vê rastiyê bo me diselimînin ku herwek li berê de hatiye gotin Qasimlo di rêbaza xwe de zindiye.

**Welatiyên têkoşer, hevalên rêzdar!**

Bi gotina rêberê me yê mezin "Dr. Qasimlo", " baştirîn padaş bo şehîdan, berdewamkirina riya xebata wan e", lewma li vê rojê de û li salvegera Şehîdên Viyenê de, em hemî pevre digel rihê paqijê Dr Qasimlo û Ebdula Qadirîazer û Dr. Fazil Resûl û hemû Şehîdên Kurdistanê, soza xwe nû dikin ku heta dawiyê, berdewamkerê doza xebata wan bin.

Hezaran silav li rihê Dr. Qasimlo û hemû Şehîdên Kurdistanê

Bi hêviya gihîştina hindî zû bi xwezî û armancên wan

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Desteya Kargêrî**

**12ê Tîrmeh a 2025 a Zayînî**



## Baweriya "Dr. Qasimlo" bi rola ciwanan li pêşeroja Kurdistanê

Dom » R:4




## Daxuyaniya hevbeş derheq pêla nû ya tepeserkirinê li Îran û Kurdistanê

Dom » R:8

# Hizrên bê hempa yên Qasimlo



N. Nûredîn Sofîzade

Hizrên modern û pêşkevtî û serdemiyane, bêguman bi wan hizr û ramiyariyane re dibêjin ku gorî jiyan û civak û siyaset û deshilatên îroyîn li cîhanê de dikare hemî aliyên jiyana civatgehê û mirovan berçav bigire, dikare wekheviyê dabîn bike, dikare demokrasiya rastîn dabinê, dikare dadperweriya civakî û qatî û siyasî bixe nava civatgehê, dikare piloralîzma siyasî û azadiya partiyan biparêze. Dikare hêza yekemîn a diyarî kirina deshilatê bide destê xelkê. Heçî kes û aliyek û hêzek ku xwedî û hilgirê wan hizran be ku bikare civatgehê bigehîne rewşeke wiha pêşkevtî, bêguman xwediyê hizrên herî pêşkevtî û modern ên serdeme.

Şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo rêberê tevgera rizgarîxwazaneya gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û Sekertêrê PDKÎ xwedî û hilgir û danerê hizr û teoriyekî herî pêşkevtî bû ku dixwast li pêşerojê de gelê me û Kurdistan bibe xwediyê deshilat û dadperwerî û siyaseta herî pêşkevtî ya cîhanê.

Di serdemekê de ku hin alî û hêzên xebatkar û siyasetmedarên Kurd di ser vê baveriyê bûn ku Kurdayetî û xebata Kurd ji bona rizgariya ji dest dagîrkerên Kurdistanê tenê divê ji riya xebateke radîkal a nasyonalîstî ve bê berçav girtin û nabe xebata Kurdan xwe girê bide bi hinek teoriyên Rojavayî wek demokrasî, lîberal, an sosyalîzm û komonîzmê û yên dinê … hwd.

Bi berewajî di demekê de ku hin hêz û aliyên siyasî û kesayetiyên Kurd û xebatkar li ser vê baweriyê bûn ku divê Kurd berî Kurdayetiyê divê di serî de xebatê bike ji bona yek ji teoriyên biyanî weke Komonîsm û Sosyalîsm û çep, û merama wan a sereke divê wekhevî û dadperweriya civakî be.

Di demekê de ku hebûn di nava xebatkar û siyasetmedarên Kurd de ku li ser vê baweriyê bûn ku ji bona vê ku Kurd bigihîjin bi qedera xwe a siyasî divê xebat tenê di çarçêveya deshilata dagîrkerên dîktator de û ji riya demokrasiyê û hilbijartinê an îmtiyazên xêr pêkirî yên dujminan ve be.

Ev jî di demekê de bû ku xwedî û hilgirên wan hizrên serve wiha hesab dikirin ku nabe çi yek ji wan hizran û teoriyan tevlîhev bên kirin, belkî divê heçî yek ji wan hizran bi awayeke serbixwe û dûr ji hizreke din û tevlî kirinekê bigihîje bi armanca xwe, lewra hertim hilgirên wan hizran dijberî hev bûn û li hember hev du de rawestiya bûn û van wisa dizanîn ku Demokrasî û Nasyonalîzm û Sosyalîzm û mafê Netewî dijî hev dune û heçî hêz û aliyek bo mînak Nasyonalîzm be, êdî nikare kesekî çep û sosyalîst be, an wisa dizanîn ku hekî kes û aliyek demokrat be , êdî nikare xebatkarekî radîkal be , an kesekî sosyal be, rast di wî serdemî de rêberê lêzan şehîd Dr. Qasimlo bas ji teoriyekê kir ku dikarî hemî wan fikr û teoriyan anku Sosyalîsm, Demokrasî, û Nasyonalîsmê bi hevre girê bide û xebata Kurd ji bona rizgariyê ewqas mecal heye ku bikare hem Nasyonalîsmeke radîkal a kurd be, hem demokrateke hilgirê fikra qebûlkirina piloralîzm û cudahiya hizban û bawerî bi hilbijartin û dengê azad ê xelkê hebe û hem sosyalîstek be ku bawerî bi dadperweriya civakî û wekheviya jin û mêran hebe û mafê zehmetkêş û hejaran jî ber çav bigre.


Dr. Qasimlo ji bona têkhelkêşkirina wan teoriyan, teoriya "Sosyalîzma Demokratîk" anî nava leyîza siyaseta Kurd û wekî armanca pêşeroja Hizba Demokrat xiste nava bernameya siyasî ya PDKÎ.

Dr. Qasimlo ku her ji temenê lawiniya xwe ve tevlî karê siyasî bibû, wî her piştî avabûna Hizba Demokrat û damezrîna Komara Kurdistanê, xebata xwe ya siyasî li nava yekîtiya Ciwanên Kurdistanê destpêkir, piştre tevlî hizba Tûde ya Îranê bû ku hilgir û teqlîdkerê Hizba Komonîst a Soviyetê bû, ji nêz ve hem di gel fikra Kurdayetiyê û hem di gel fikra çep a basê dadperweriya civakî û mafê zehmetkêşan dikir, aşina bibû.

Piştre ku Dr. Qasimlo ji bona xwendina bilind diçe Ewropa û li du qonaxan de li welatên Wekî Firansa û Çekoslawakiya dixwîne heya doktoraya xwe ya li ser rişta abûriya siyasî werdigere û piştre her li Ewropa dibe mamostayê zanîngehê, rast di wî serdemî de dikeve nava karê siyasî yê PDKÎ de.

Şehîd Dr. Qasimlo berê ku gelek baş di gel hizra siyasî a Kurdayetî "Nasyonalîsm" û edaleta civakî "Sosyalîsm" aşna bibû, vê carê li ewropa digel demokrasî û hizrên pêşkevtî nasiyar bû.

Şehîd Dr. Qasimlo ku xwe wekî siyasetmedarekî lîberal û maksîst didît, dema ku kevte nava xebata Hizba Demokrat û bitaybetî berpirsayetiya yekem a vê Hizbê kevte ser mil, xwast teoriyeke nêzîk li îmkanê bîne nava teoriyên wê serdema xebata siyasî, û bo cara yekem di kongira 5 a Hizbê de bas ji vê hizra xwe kir û Kurd û bi taybet Hizba me dikare wan teoriyên ji hev cuda pêkve girê bide.




Di wî serdemî de Kongira 5, hinek endamên Hizbê mabûn heyrî ku çawa dibe Nasyonalîsm û Sosyalîsm û Demokrasî bihevre bên girêdanê.

Berevaniya Rêberê mezin û xwedî ezmûn û piraniya wan teoriyan ji nêz ve naskirine û xalên lawaz û dewlemend ên wan teoriyan naskirine û ceribandine, ev bû ku em wekî Kurd û Hizba Demokrat di vê qonaxê de xebatê dikin ji bona azadî û rizgariya Kurdistanê heta ku gelê me bikare qedera xwe ya siyasî netewî bigre dest xwe, bo gihîştin bi vê armanca pîroz û netewî jî em mifahê ji heçî rê û mikanîzmeke xebatê werdigrin û xebata xwe bi rewa dizanin, dema ku wisaye em Hizbekî radîkal û nasyonalîsm a Kurd in.

Em dema xebatê dikin ji bona azadiya neteweya xwe, bê guma hemî qatên civakê, hemî texên nava Kurdistanê, hemî cudahiyên olî, devokî, cinsiyetî, gundî, bajarî, xwendewan, nexwendewan, dewlemend, hejar, mamosta, cotiyar û kirêkar, civatgeha kurdistanê û gelê me pêktînin, ku wisaye dema Kurdistan rizgar bû ji dest dagîrkariyê û Kurd xwe hakimê xwe bû, em wekî PDKÎ wekî aliyekî siyasî ger ji riya hilbijartina azad a xelkê xwe ve gihîştn bi deshilatê, bê guman em ger nekarin dadperwerî û wekheviyê di nava civatgeha Kurdistanê de çêbikin, renge tenê rizgar kirina Kurdistanê têrê neket, divê em bikarin wekheviya di navbera jin û mêran bi kiryar cîbicî bikin, divê em bê mafiya ku karger û zehmetkêşên Kurdistanê bi dirêjahiya dîrokê di gel de hember bûne, li ser wan rakin û divê hemî xelkê Kurdistanê û bi taybet qata zehmetkêş û karger û kêm dahat, bikare ji serwet û dahata welat behremend be, hingê me kariye bi awayekî dadperwerane hemî civatgeha kurdistanê bi çavekê mêze bikin.

Dr. Qasimlo ku li Ewropa ezmûnên baş li ser hilbijartin û azadiya partiyan, û destaûdest kirina deshilatê ji riya hilbijartinê û dengê xelkê ve peyda kiribû, li ser vê bawerê bû ku êdî ev serdem bi ser çoye ku hizr û îde û teoriya kite hizbekê tenê bikare îdara civatgeha welatekê bike û her tişt di qorixa aliyekê de be ku pitir part û aliyên komonîstî û hizrên çep ên pirotariya kirêkarî ku ji sovîyetê ve banga dadperweriya cîhanê dida, xwediyê vê hizra siyasî bûn ku nabe ji bilî wan tu alî û hêzekî siyasî û teorî serî hilbide û hebe.

Dr. Qasimlo wisa hesab dikir ku hizbek an hikûmetek dikare nasyonalîsm be, dikare çep be û basê dadperweriya civakî û mafê zehmetkêşan bike, hev dem dikare demokrat be jî, tu aliyek nikare bas ji edaleta nava civakê bike, bas ji wekheviya jin û mêran bike, bas ji dabînbûna mafê zehmetkêşan bike, lê xwe sepên be û amade nebe wî mafî bide xelkê ku herbixwe bi dengê xwe deshilata birêveberiya xwe hilbijêrin.

Demokrasî, Hilbijartina azad, azadiya hizban" piloralîzm" qebûl kirina hizr û teoriyên cuda, azadiya rojnamevanî, azadiya hebûna mafê nerizayetiyê û mangirtinê, hebûna mafê raderbirîna azad û bi giştî hemî ev mafên ku aliyek ji bo xwe bi rewa dizane , divê ji bo her aliyekî siyasî bi rewa bizane, bi wateya hebûna demokrasiyeke rasteqîne ye. Wate li civatgehê de tu kes li ser hebûna eqîde, bîr û bawer, fikra siyasî, nekeve ber xezeba deshilatê û neyê tepeser kirin û maf jê qedex nebe.

Dr. Qasimlo ev 3 mijar û hizrên ku heya wî serdemî her kesî û bi taybet xebatkarên Kurd wisa dizanîn ku dijberê hev in, wate Nasyonalîsm, Demokrasî, û Sosyalîm, kirine yek dirûşm û li ser vê bawerê bû ku civatgeheke wekî ya Kurdistanê, hewcehî bi her 3ê teoriyan heye û kurd nikare bêje ez sosyalîstim û nikarim demokrat bim, Kurd nikare bêje ez xebatkarekî radîkal ê netewî me nikarim dadperwer û sosyal, an demokrat bim.

Dr. Qasimo qonaxê peyrewî kirin ji vê têkheklêşa wan teoriyan ji hev cuda kiribûn. Em niha di halê xebatê dan e rû li ser deshilatê ninin, lewra xebata me hewcehî bi metodên cuda yên xebatê heye, lê ya girîng eve ku dema piştî rizgariyê em bikarin bo xelkê xwe, bibin bi deshilateke Demokrat, Sosyal, û welatperwer.

# Li Piragê Ve Bo Kurdistanê, Ji Nû Ve Pênasekirina Tevgera Kurdistana Îranê di Ramanên Dr. Qasimlo de





N. Serbet Urmiye

**Destpêk**

Di navbera dehsalên 1340 heya û 1350'an ên Rojî de, veguherînek bingehîn bi ser tevgera rizgarîxwaziya neteweyî ya Rojhilatê Kurdistanê de hat. Guhertinên ku di doma rê û armancên Komara Kurdistanê de, tevgera rizgarîxwaziya neteweyî ya Rojhilatê Kurdistanê ji pêkhateyeke leşkirî û di bin siya hizr û rêkxistinên eşîretî de bi tevahî veguherî û di pêkhateyeke neteweyî, siyasî, sivîl û xwedî raman de rêkxist. Di vê navberê de, Dr. Ebdlurahman Qasimlo, bi ezmûnên xwe yên li Rojhilata Ewropayê, nemaze Bihara Piragê ya sala1968'an, hewil da ku asoyek nû ji ber têkoşîna neteweyî ya gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê veke. Di vir de hewil hatiye dan ku rola Dr. Qasimlo di guhertina tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi ji nû ve avakirina Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de, dahênana hizra xweserî(otonomî)a demokratîk û bi hevre girêdana pirsa neteweyan bi demokrasiyê ve, were şirove kirin.

**Pirag: xala guhertina ramanên siyasî yên Qasimlo derheq doza Kurd**

Qasimlo di salên 1950an de bo xwendina zanistên aborî çû Zanîngeha "Charles" li Piragê. Çûna wî hevdem bû bi serhildana reformîst a li Çekoslovakyayê û serhildana bi nav a Bihara Piragê ya sala 1968an re. Wî pêvajoya hevgirtina sosyalîzm û azadiyê di vê serhildanê de weke ezmûn dişopand . Tepeserkirina vê serhildanê ji aliyê Sovîyetê ve, Qasimlo ji aliyên nerênî û serberedayîbûna desthilata îdeolojîk haydar kir. Lewma di hizra wî de, sosyalîzm bê hebûna azadiyên takekesî û neteweyî, tenê rûyek din a zordariyê bû.

**Nûjenkirina PDKÎ'ê: Ji Pêkhateya kilasîk ve bo Rêkxistineke serdemî**

Dubare vegerîyana Qasimlo bo qada siyasetê di Îranê û Rojhilatê Kurdistanê de, hevdem bû bi ji nû ve vejandina Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê(salên 1340'an ên Rojî). Wî li ser binêşeya sosyalîzm û demokrasiyê manîfesteke nû pêşkeşî tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê kir. Hewil da nifşa ciwan û xwendekar tevlî tevgerê bike û ji bo berfirehtirkirina tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê, têkilî bi hêz û aliyên pêşverû yên cîhanî û Îranî ve kirin. Bî vî terzî û bi ramana xwe ya nû û herwiha pesendkirina Sosyalîzma Demokratîk, weke pirensîpeke bingehîn di tekoşîna pêşerojê, Dr. Qasimlo guhertineke mezin di pêkhate û siyasetên Partiya Demokrat a Kurdistanê de pêk anîn û ji sîstema berê ve guherî bo rêkxistineke xwedî raman, nûjen û serdemî.

**Sosyalîzma Demokratîk, xala cudahiyê û nîşana pêşkewtinê**

Hewla Dr. Qasimlo ji bo pesendkirina sosyalîzma demokratîk di destûra bingehîn a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de, xizmeteke mezin bû di warê ji hev nêzîk kirina aliyên hizrî û rewşenbîriyê di navbera endaman de(PDKÎ), vexwendina nifşên ciwan û rewşenbîrî, xurtkirina meşrû'îyeta hindûr rêkxistinê û meşrû'îyeta siyasî di civaka sivîl de, bi deng ve hatina daxwazên çîna kedkar, mamoste, cotkar û kêmneteweyên bindest, hev terîb bûn bi nirxên cîhanî yên mafên mirovan û dadperweriya civakî re, rê xweşkirina alîkarîyê bo partî û tevgerên pêşverû yên cîhanê, jordebirina pêgeha partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di civat û medyayên siyasî yên cîhanî de û cuda kirina hêla siyasî û tekoşîna PDKÎ'ê ji rêkxistinên çekdar ên radîkal û tundajû de. Guhertina han di siyaset û ji nû ve avakirina PDKÎ'ê de, di heman demê de ku nîşana diyar a xebata rewşenbîrî û siyasî ya PDKÎ'ê bû, stratejiyeke bibandor bû jî bû, bo yekxistina vê partiyê , vexwendina hêzên nû û bi hev re girêdana civaka Kurdistanê û cîhana derve.

**Pilatforma Xweserî(otonomî)ya Demokratîk: Mînakek ji bo bi hevre jiyanê di Îranê de**

Di deh salên 1350'an de, Dr. Qasimlo pilatformrke pir alî li ser bingeha perwerdehiya bi zimanê dayikê, hilbijatrina encumenên herêmî, mafên jinan, azadî bo partiyên siyasî û pir rengiya çandî û..., ji bo xweseriya demokratîk pêşkêş kir. Pilatforma han ne di reng û ramana cudahîxwaziyê de xwe pênase dikir, belku tekez li ser beşdariya pêkhateyên neteweyî di çarçoveya Îraneke yekgirtî de dikir. Mînakek kêrhatî û hemşêveya ezmûna welatên pir-netewe û li ser bingeha dadperweriya neteweyî, siyasî û civakî.

**Serhildana 1357'an Rojî û Berhevketina Du Nêrînan derheq Îran a Pir-Neteweyî**

Bi serkeftina şoreşê, ji aliyê gelê Kurd ve piştevaniyeke berfireh ji Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê hate kirin. Dr. Qasimlo hewil da ku di rêya gotûbêj û danûsitandinê de bi hikûmeta demkî ya vê demê û piştre bihikiûmeta di bin serok komariya Benî Sadir de,
pilatforma xweseriyê(otonomiyê) bike çarçoveyek yasayî. Lê îdeolojiya hişk û req a rejîma nû hatî ser kar, nemaze dijberiya Ayetullah Xumeynî li hember hemû şêweyeke xwerêveberiyê xêncî xwerêveberiya Îslamî ya li gor hizra wî û her wiha zalbûna rewş û ramana ewlekariyê di heyamê serkevtina serhildanê de( heya niha jî), bûne sedema astengkirina danûstandinan û destpêkirina şer li Kurdistanê. Lê serbarê xurtbûna şerê çekdaryê jî, Dr. Qasimlo her tim girîngî dida çareseriyên siyasî û dîplomatîk.

**Qasimlo; Dîplomatekî Navneteweyî û Dengê Kurd di Cîhanê de**

Şarezayî û zalbûna Dr. Qasimlo bi ser çend zimanên zindî yên cîhanê û têkiliyên wî yên berfireh bi saziyên navneteweyî re, di nava hêzên nerazî yên rejîma Îslamî de, kesayeriyeke berçav û pêgeheke diyar ji Dr. Qasimlo re misoger kirin.

Dr. Qasimlo ji konferansên navneteweyî weke derfet û çeperekê ji bo derbaskirina pirsa gelê Kurd ji pirseke qewmî(etnîkî) ve bo pisreke neteweyî û demokratîk, mêze dikir û mifah jê werdigirt. Wî hewil da ku pisra neteweyî di Kurdistan û Îranê de cîhanî û berfireh bike. Rêbazek ku heya niha jî tê meşandin.

**Encam**

Di navbera Bihara Pragê û Rêbendana 1357'an a Rojî de de, Dr. Qasimlo, him wekî rewşenbîr û him jî wekeî bîrmendekî siyasî, bingehên rewşenbîrî yên nû ji bo tevgera Kurd li Îranê danîn. Pilatforma wî ya derheq otonomiyê ku li ser bingeha azadî, dadperwerî û demokrasiyê ava bibû, hîn jî wekî yek ji mînakên herî pêşkeftî ji bo çareserkirina pirsgirêka neteweyan di Îranê de tê hesibandin. Terorkirina wî li Viyanayê di sala 1989'an a Zayînî de, ne dawiya rêya wî bû, berevajî destpêka rêyeke nû bû ku heta îro jî berdewam û pir rêving e.

# Baweriya “Dr. Qasimlo” bi rola ciwanan li pêşeroja Kurdistanê



N. Bêhzad Qadirî
W. Bêhzad Simko



“Dr. Ebdulrehman Qasimlo”, rewşenbîr, siyasetvan û rêberê Karîzmatîmkê Kurd û Sekreterê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, li hember rola ciwaqnan li civakê de dîtingehek kûr, pêşkevtiyane û pêşerojbîn hebû.

Nivşa nû li dîtingeha siyasiya wî de hêza bizvêner a tevgera netewî û dêmokratîka Kurd û avakerê binyata nû ya cîvakî, kultûrî û siyasiya Kurdistanê ye.

“Dr. Qasimlo” bi têgihîştinek kûr ji pêşhatên cîhanî û deverî, bi berdewamî li gotar û nivîsên xwe de li ser giringiya rola ciwanan li proseya derbasbûn li sitemkariyê ve bo dêmokrasiyê û ji pesîvatiyê ve bo praktîka hişyarane, tekezî kiriye.

“Dr. Qasimlo” li ser vê baweriyê bû ku bê amadebûna hişyarane, afirêner û çalakaneya “,nivşa nû”, ti guherînek berdewam û avaker çê nabe û hekî em bixwazin pêşerojek azad û dêmokratîk bo gelê xwe ava bikin, dibe ciwanan fêrî hizînê bikin, neku fêrî vê bikin ku hizir li çi tîştekê bikin, çimkî civakek azad, bi ciwanên azad û hişyar tê avakirin.

“Dr. Qasimlo”, ciwan bi komek lipeyketî nedizanî, belku bi nivşeke berpirsyar, rexnegir û hişmend dizanî ku dibe bo avakirina paşerojê, hem waneyan jî dîrokê verbigrin û hem jî çavê wan bi pêşerojê be.

“Dr. Qasimlo” hertim li navbera “xebata çekdarî” û “xebata hizrî û siyasî” de cudatî datîna û baweriya vî wa bû ku ciwanê Kurd nabe her bi tenê çekê hilbigre, belku dibe bizane ku bo çi xebatê dike û çi pêşerojekê dixwaze.

Azadî bi tenê bi qurbanîdanê bi dest ve nayê, belku bi hişyarî, perwede û plandanînên siyasî bi dest ve tê.

Bi hizra “Dr. Qasimlo”, nivşa nû dibe bi zanista siyasî û bi hişmendiya civakê bê teyarkirin, bo evê ku ne tenê li meydana xebat, belkû li serdema danîna binyat û avakirinê de jî, rol hebe.

**Dr. Qasimlo” rêkxistina ciwanan bi “Xwendingeha Demokrasiyê” dizanî û tekez li ser vê kiriye ku: “Yekîtiya Ciwanên Dêmokrat”, hewce ye qutabxaneyek be bo perwede û hînkariya kadrê hizrî û siyasî.**

Paşeroj ya we ye, lê avakirina paşerojê bibê rêkxistinkirin, ti îmkanek nîne. Dibe fêr bin ku çawa bikarin hem rexnegir û hem berpirsyar bin”.

“Dr. qasimli” li ser erk kêşana ustiyê xwe, hevkarî, rexneyên navxweyî û perwerdeya rêberatiya nû, tekezî dikir.

Yek ji xalên xuya yên hizrîna “Dr. Qasimlo”, rexneya wî li rêberatiyên parêzkar û tekezkirina wî li ser veguhastina hişyarane a desthilatê bi nivşa nû bû. “Dr. Qasimlo” hizir dikir ku guherîna cîhanê bê guherîna hizrîn a nivşa nû, ti îmkanek nîne.

Nivşa nû dibe pirsyarker, şirovekar û rexnegir be, ne lipeykevtî. “Dr. Qasimlo” li gorateke xwe de dibêje: “rêberên nivşa me dibe cihê xwe bidin nivşa nû, nek wa hizir bikin ku ev anku ciwan pênegihîştî û bê şiyan in. Ev dîtingeha , nîşanderê têgihîştina dêmokratîk û berpirsyarane ya Dr. Qasimlo li modernizasiyona siyasî li tevgera Kurdî de bû.

Li hevpêeyvîneke têlêvîzyonî de jî, “Dr Qasimlo” bi eşkere û rohnî dibêje: “Em nivşik in ku daxwaza xudmuxtarî li çarçoveya Îranê de dikin, lê em nikarin garantiya nivşî bê bikim.

Renge ew xudmuxtariyê nexwazin û daxwaza serbixweyiyê bikin. Li wir de “Dr. qasimlo”, baweriya xwe bi ciwanên Kurdistanê dide nîşandan.

Xuya ye ku bi bawera wî, hekî nivşa wan nekarin serbixweyî yê bo Kurdistanê bi dest ve bînin, ev nivşa bê ya Kurdistanê, dikarin û ev hebxwe dikarin qedera xwe destnîşan bikin. Herwisa tê xuya ku “Dr. Qasimlo” serbixwyiyê înkar nake û bawerî bi eniya nû ya Kurdistanê heye.

Li hizra “Dr. Qasimlo” de ciwan hêza pênegihîştî nîne, belku endazyar, mûhendis û arşîtektê paşerojê, ev in. “Dr. Qasimlo” bi dîtingehek perwerdeyî, siyasî û teşkîlatî mêzeyî ciwanan dikir û bawera wî ev bû ku rizgariya Kurdistanê, bê nivşa zana, bivêr û berpirs, ti îmkanek nîne.

Lewma perwerdekirina nivşa nû, yek ji binyatên startejîk ên xebata vî bû, ne tenê bo azadî, belkû bo avakirina civakek mirovî, vekhev û modern jî bû.



# Qasimlo rêberek ji bo hemû nifşan



N. Dr. Mecîd Heqî

Di dîroka neteweyan de, kêliyên biryardar hene ku rêça neteweyek bi dehsalan diyar dikin. Ev kêlî pir caran bi derketina holê ya rêberên ku ji rewşa heyî wêdetir difikirin û bi nêrînek pêşerojê, hewl didin ku civaka xwe ji şikestinên dîrokî û zordariya avahîsaziyê ber bi perspektîfên geştir ve bibin, re tîne. Dr. Abdolrehman Qasimlo, Sekreterê Giştî yê berê yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, yek ji van rêberan e. Kesayetiyek ku ne tenê di nav neteweya Kurd de, lê di heman demê de di asta herêmî û cîhanî de wekî sembola rasyonelîteyê, lêgerîna aştiyê û rêberiya demokratîk tê nasîn.

Di serdema aloz a dîroka hemdem a Kurdistan û Rojhilata Navîn de, di nîvê şer, şoreş û zordariyên dewletên dagirker de, Qasimlo ala diyalog, demokrasî û edaleta civakî bilind kir. Ew rêberek bû ku çekan wekî çareya dawîn û ziman wekî amûra yekem a azadiyê didît. Şêwaza rêbertiya Qasimlou dikare di çarçoveya teoriyên rêbertiya siyasî de, nemaze Rêbertiya Veguherîner û Rêbertiya Rasyonel-Qanûnî ya Max Weber, were analîz kirin; modelek ku ne tenê li ser karîzmaya takekesî, lê li ser reformên avahîsaziyê, avakirina baweriya civakî û diyaloga berdewam ava bû.

Di vê gotarê de, bi karanîna teoriyên hemdem ên serokatiya siyasî û teoriyên tevgerên rizgariyê, dê pozîsyon û rola Qasimlo di pêşketinên siyasî yên li Kurdistana Îranê û têkoşîna ji bo mafên neteweyî û demokratîk de were lêkolîn kirin. Em ê her weha cûdahiya bingehîn a di navbera gotara wî û gotarên totalîter û otorîter de analîz bikin. Qasimlo ne tenê siyasetmedarek bû, lê di heman demê de mîmarê gotarek azadîxwaz a aştîxwaz ji bo neteweyek bindest bû.

**Qasimlo di Çarçoveya Dîrokî û Siyasî ya Kurdistan û Îranê de**

Ji bo têgihîştina helwesta Dr. Qasimlo, divê mirov pêşî şert û mercên dîrokî û avahîsaziyê yên Îrana hemdem, bi taybetî têkiliya wê bi neteweyên ne-Farisî, bi taybetî neteweya Kurd re, lêkolîn



bike. Ji serdema Meşrûte ve, avahiya siyasî ya Îranê her tim li ser komkirina hêzê, înkarkirina nasnameyên ne-Farisî û tepeserkirina daxwazên kom û neteweyên etnîkî hatiye avakirin. Siyaseta "yek netewe, yek ziman, yek ol" di monarşiya Pehlewî û dû re jî Komara Îslamî de her tim li ser înkarkirina mafê diyarkirina çarenûsê, zimanê dayikê, perwerdehiya xwecihî û beşdariya siyasî ya gelên ne-navendî hatiye avakirin.

Di vê navberê de, neteweya Kurd li rojhilatê Kurdistanê ji dîrokê ve ji mafên herî bingehîn ên sivîl, çandî û siyasî bêpar maye. Ji darvekirina Qazî Mihemed di sala 1948an de û tepeserkirina Komara Kurdistanê bigire heya tepeserkirina xwînî ya tevgerên gelêrî di salên 1971an de û piştî şoreşa 1979an, Komara Îslamî jî rêya tepeserkirin û tasfiyekirinê domand.

Di şert û mercên wisa de, Dr. Qasimlo di salên 1970an de wek Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê hate hilbijartin. Wî li Çekoslovakya û Fransayê di warê aborî û zanistên siyasî de perwerde dît û bi gelek zimanan, di nav de fransî, almanî, îngilîzî, rûsî û erebî, şareza bû. Ev paşxaneya rewşenbîrî û navneteweyî hişt ku ew tevgera Kurd ji tevgereke neteweyî ya herêmî ber bi tevgereke neteweyî-demokratîk li ser asta Îran û heta Rojhilata Navîn ve bilind bike.

Qasimlo, rexne li avahiyên partiya kevneşopî digirt û pêwîstiya modernîzekirina rêxistina siyasî ya Kurdistanê tekez dikir. Berevajî rêberên kevneşopî yên ku desthilatdariyê di navbera malbatan de belav dikirin an jî saziyên etnîkî yên girtî, wî hewl da ku partiyek ava bike ku bingehên wê li ser beşdariya giştî, hilbijartinên navxweyî, pêşketina jinan û tekez li ser perwerdehiya siyasî û çandî bin.

Bi hay ji meylên cîhanî, nemaze piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn û mezinbûna tevgerên dij-kolonyalîst li Asya û Afrîkayê, wî bawer dikir ku tenê bi tekez kirina li ser edaleta civakî, diyaloga siyasî û mafên mirovan dikare asoyek nû ji bo gelê Kurd were xêzkirin. Ev helwest ne tenê wî li dijî zordariya Komara Îslamî danî, lê di heman demê de hin meylên çepgir ên tundrew an hêzên muhafezekar ên di nav tevgera Kurdistanê de jî xist nav dijberiyê. Qasimlo bi awayekî rast fêm kir ku Kurdistana Îranê ne tenê bi mijara nasnameyê, lê di heman demê de bi newekheviya aborî ya avahîsaziyê, cudakariya çînî û paşketina ferzkirî re jî eleqedar e. Ji ber vê yekê, di gotara wî ya siyasî de, mijarên girîng ên wekî "pirsgirêka xwedîtiya erdê", "perwerdehiya jinan", "rêxistina karkeran" û "dadmendî di belavkirina hêz û çavkaniyan de" cihekî navendî girtin. Ji vê perspektîfê ve, ew dikare di heman kategoriyê de wekî rêberên rizgariya gerdûnî yên wekî Nelson Mandela, Patrice Lumumba, an Ben Bella were danîn, ku rizgariyê tenê wekî serxwebûna siyasî nabînin, lê belê wekî pêvajoyek berfireh a ku armanc dike ku neteweyê bihêz bike û mirovê azad ji nû ve pênase bike.

**Şêwaza Rêbertiya Qasimlo: Karîzma, Aqilmendî û Diyalog**

Dr. Qasimlou ji hêla gelek kesan ve bi rûyê xwe yê aram, dengê xwe yê nerm, kenê xwe yê germ û helwesta xwe ya aram tê bîranîn. Lê ji bilî vê xuyabûna derve, wî cureyek rêbertiyê temsîl dikir ku tê de karîzma, aqilmendî û diyalog bi awayekî hevseng û bi bandor bi hev ve girêdayî bûn. Şêwaza rêbertiya Qasimlou dikare di çarçoveya teoriyên rêbertiya siyasî de, nemaze modelên "Rêbertiya Veguherîner" û "Rêbertiya Aqilmend-Qanûnî" yên Max Weber de were analîzkirin.

Di teoriya xwe ya navdar de, Max Weber behsa sê cureyên meşrûtiyetê di desthilatdariyê de dike: meşrûtiyeta kevneşopî, karîzmatîk û meşrûtiyeta aqilmend-qanûnî. Gelek rêberên tevgerên rizgariyê - ji Che Guevara bigire heya Ho Chi Minh û Mao - li ser cureyek karîzmaya kesane ava bûn. Karîzmayek ku tê de dilsoziya girseyan ji kesayetiya rêber re ji avahî an bernameyê mezintir e. Lê Qasimlo, berevajî vê meylê, her çend xwedî kesayetiyek karîzmatîk bû jî, rewatiya xwe bêtir li ser bingeha aqilmendî, aqilê kolektîf, diyalog û qanûnîbûnê ava kir. Li şûna ku rêber biperize, wî hewl da ku di partî û civakê de saziyên aram, perwerdehiyî û beşdar ava bike.

Di atmosfera siyasî ya Rojhilata Navîn de, ku tundûtûjî pir caran zimanê serdest ê siyasetê ye, Qasimlo ne wekî taktîkek, lê wekî stratejiyek siyasî û çandî ya bingehîn helwestek li ser "diyalogê" şopand. Ew bawer dikir ku tu hêz nikare bi rêya tepeserkirina daîmî neteweyek hilweşîne, lê netewe jî bi çekan azadiya rastîn bi dest naxin.

Ew yekem rêberê Kurd li Îranê bû ku bi hikûmeta Komara Îslamî re diyalogek rasterast û nerasterast kir - gavek ku wêrek, xeternak û, di çavên hin çepgi-

Dom » R:6

# Qasimlo rêberek ji bo hemû nifşan

Doma » R:5

ran de, heta tawîzkar jî dihat hesibandin. Lê Qasimlo têgihîştinek stratejîk a têgeha aştiyê hebû: aştî ne tê wateya teslîmbûnê, lê belê afirandina platformek ji bo diyalog û zexta siyasî ya rewa ji bo bidestxistina mafên kolektîf bû. Di vê rê de, Qasimlo ne tenê bi hikûmeta navendî re, lê di heman demê de bi rêxistinên navneteweyî, partiyên din ên Îranî, rewşenbîrên Faris û heta bi rexnegirên navxweyî yên partiyê re jî diyalog kir. Ev taybetmendî wî kir yek ji wan çend serokên Kurd li Kurdistanê ku li derveyî erdnîgariya xwe ya neteweyî diaxivî û dengê wî dihat bihîstin.

**Edaleta Civakî û Exlaqa Siyasî di Şêwaza Rêbertiyê de**

Taybetmendiyeke din a berbiçav a rêbertiya Qasimlo pabendbûna wî ya exlaqî ya bi edalet, rûmeta mirovan û azadiyê re bû. Heta di serdema berxwedana çekdarî de jî, wî tekezî li ser muameleya bi girtiyên şer, mafên sivîlan û pabendbûna bi prensîbên mirovî di şer de kir. Ji bo wî, armanc nikaribû rêbazan rewa bike.

Ev aliyê exlaqî di rêbertiya Qasimlo de dikare bi paralel bi rêberên wekî Gandhi û Nelson Mandela re were analîzkirin. Çawa ku Gandhi li ser "ne-tundûtûjî" (ahimsa) wekî felsefeyeke siyasî israr kir, Qasimlo jî bawer dikir ku siyaseta bê exlaq dibe amûreke zordariyê.

Di dîroka tevgerên rizgariyê de, çend rêber hene ku ji çarçoveya kevneşopî xilas dibin û rêxistineke nû ji bo neteweya xwe bi perspektîfeke modern û avahîsazî ava dikin. Dr. Qasimlo yek ji mînakên herî berbiçav ên van rêberan e. Ew ne tenê rêberê siyasî yê partiyekê bû, lê di heman demê de mîmarê modernîzasyoneke bingehîn di Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û gotara siyasî ya Rojhilatê Kurdistanê de bû. Ev rola veguherîner wekî taybetmendiya dîrokî û stratejîk a herî girîng a Qasimlo tê hesibandin.

Di teoriyên hemdem de, "seroktiya veguherîner" behsa serkirdayetiyê dike ku ji rêveberiya rojane wêdetir diçe da ku guhertinên bingehîn di avahî, nirx û asoyên rewşenbîrî yên rêxistinekê de çêbike. Li gorî James McGregor Burns, serkirdayetiyek veguherîner kesek e ku îlham dide, asoyan diafirîne, baweriyê ava dike û hêzê bikar tîne da ku yên din bihêz bike, ne ku wan serdest bike.

Qasimlo mînakek zelal a vê şêwaza serkirdayetiyê bû. Bi perspektîfek nû, wî Partiya Demokratîk ji partiyek kevneşopî, baviksalar, eşîrî û bi tenê bi derdorên mêran ve sînordar, veguherand partiyek nûjen, demokratîk, beşdar û civak-navendî. Wî ev veguherîn ne bi karanîna hêzê, lê bi rêya razîkirin, diyalog û avakirina saziyên domdar pêk anî.

Yek ji destkeftiyên girîng ên Qasimlo di modernîzasyona siyasî de tekezî li ser beşdariya jinan di avahiyên partî û civakî de bû. Di rewşek de ku civaka Kurd li rojhilatê Kurdistanê, mîna gelek civakên kevneşopî yên li Rojhilata Navîn, bi sînorkirinên giran ji bo jinan re rû bi rû ma, Qasimlo tekezî li ser hebûna çalak, hişmend û rêxistinkirî ya jinan di nav refên partiyê de kir. Ev nêrîna wî ji têgihîştina wî ya kûr a têgeha demokrasiya civakî derketiye holê, ne tenê jestek siyasî ye.

Bi heman awayî, wî ciwan, mamoste, karker û cotkar jî di navenda bernameyên siyasî yên partiyê de danîn, ne wekî şopîner, lê wekî hêzên afirîner û avaker. Di dema serokatiya wî de, perwerdehiya siyasî ji bo nifşê ciwan berfireh bû, weşan û çapemeniya partiyê çalak bûn, û nêrîna elîtîst a kevneşopî ya siyasetê rê da perspektîfek beşdarbûnê.

Geşedanek din a girîng di gotara siyasî ya Qasimlo de, veguherîna ji etnosentrîzma kevneşopî ber bi neteweperestiya sivîl ve bû. Wî Kurdbûnê ne li ser bingeha xwîn, nijad, an eşîrê, lê li ser bingeha ziman, çand, girêdana dîrokî û îradeya siyasî ya gel pênase kir. Ji ber vê sedemê, partiya di bin serokatiya wî de ne tenê li rojhilatê Kurdistanê, lê di nav beşên gelên Faris, Azerî û Belûç de jî bala û piştgirî kişand.

Daxuyanî û hevpeyvînên wî her gav behsa demokrasiyê ji bo hemî neteweyên Îranî dikirin, ne tenê ji bo Kurdan. Ew bawer dikir ku "pirsgirêka Kurd pirsek cîhanî ye" û çareseriya wê di ji nû ve avakirina avahiya siyasî ya Îranê di çarçoveya demokrasî, federalîzm û edaleta civakî de ye. Bi raya wî, ger beşên Kurdistanê bi tevahî serxwebûna xwe bi dest bixin, ev nayê wê wateyê ku welat hilweşe, lê belê yekbûna welatekî ku berê hatibû parçekirin.

Digel ku gelek tevgerên li Rojhilata Navîn ji hêla kesayetî û karîzmaya rêber ve hatine şekilkirin, Qasimlo tekezî li ser avakirina saziyan kir. Di axiftinekê de di pilonoma sala 1989 de, du mehan berî ku bê teror axiftinek kiribû ku dikarin wata ya wê bi wî awayî kurt bikeyn:

"Ez naxwazim neteweya Kurd Qasimloperest be; ez dixwazim pêşerojek ava bikim ku bêyî Qasimlo jî mezin bibe."

Di dema rêberiya wî de, avahiyên partiyê yên wekî Kongre, Konferansa Partiyê, Komîteya Navendî, Polîtburo, Yekîtiya Jin û Ciwanan û medyaya partiyê çalak bûn. Perwerdehiya siyasî li seranserê civaka Kurd hate berfireh kirin, û partî hewl da ku siyasetê ji elîtê bîne gund, atolye û dibistanan. Ev vîzyona avahîsazî û mayînde yek ji wan sedeman bû ku çima ramanên Qasimlo piştî kuştina wî mabûn.

**Qasimlo û Tevgera Rizgariya Neteweyî li Kurdistanê**

Tevgerên rizgariya neteweyî bi gelemperî di bersiva kolonyalîzma biyanî, dagirkirina leşkerî, an serdestiya emperyalîst de derketine holê. Lê li gelek welatên ku bi avahiyên "kolonyalîzma navxweyî" re rû bi rû ne - wek Îran - neteweyên nenavendî jî ji bo xweçareseriyê, nasnameya çandî, edaleta zimanî û beşdariya siyasî têdikoşin. Neteweya Kurd mînakek sereke ya rewşek wusa ye, û Qasimlo yek ji rêberên herî hizirmend û pragmatîk ên vê tevgerê ye.

Teorîsyenê dij-kolonyalîst ê navdar Franz Fanon di berhemên xwe de behsa celebek "kolonyalîzma navxweyî" dike - dewletek ku tê de hêza navendî (dewleta neteweyî) neteweyên neserdest bi rêya tepeserkirinê, înkarkirina çandî û cudakariya avahîsaziyê marjînalîze dike. Li Îrana hemdem, neteweyên Kurd, Tirk, Belûcî, Ereb û Tirkmen hemî bûne qurbaniyên polîtîkayên weha. Dewlet ne tenê nasnameya wan înkar dike, lê di heman demê de wan di belavkirina çavkaniyan, hêza siyasî, xizmetên giştî û perwerdehiyê de di rewşek jêrîn de jî datîne. Bi têgihîştineke kûr a vê diyardeyê, li şûna ku bi protestoyên çekdarî an serhildana pasîf razî bibe, Qasimlo hewl da ku tevgera Kurd bigihîne asta têkoşîneke neteweyî-demokratîk; têkoşîneke ku ne tenê neteweyî bû, lê di heman demê de trans-çînî, civakî û li ser bingeha rewatiya navneteweyî bû.

Di axaftina xwe de, têkoşîna ji bo zimanê Kurdî, perwerdehiya xwecihî û rêveberiya herêmî ligel daxwazên wekî edaleta aborî, dabeşkirina erdê ya dadperwer, wekheviya zayendî û mafên karkeran hate bilindkirin. Ji ber vê sedemê, tevgera di bin serokatiya wî de hem aliyek neteweyî û hem jî aliyek lêgerîna edaletê hebû, û ji hêla beşên cûda yên civaka Kurd ve hate pêşwazîkirin.

Qasimlo bawer dikir ku avakirina neteweyê pêvajoyek e ku ji dilê têkoşîna li dijî serdestiyê û bi rêya avakirina saziyan, perwerdehiyê û ji nû ve pênasekirina xweya kolektîf pêk tê. Ji bo wî, Kurdbûn ne rewşek abstrakt an hestyarî bû, lê projeyek çalak ji bo ji nû ve avakirina çandî, siyasî û civakî bû.

Ew dizanibû ku neteweya Kurd dikare cihê xwe li ser nexşeya siyasî ya herêmê ne bi rêya hesta bindestiyê, lê bi rêya hilberîna zanînê, hevgirtina rêxistinî, diyaloga civakî û têgihîştina qanûna navneteweyî ava bike. Ji ber vê sedemê, weşandina kovaran, lidarxistina civînên rewşenbîrî, perwerdekirina kadroyên siyasî û têkiliya bi elîtên ji cîhana Ereb, Ewropa û Îranê re beşek girîng a projeya avakirina neteweyê ya Qasimlo pêk anî.

Qasimlo bi kûrahî baweriya xwe bi mafê neteweyan, di nav de neteweya Kurd jî, dianî ku çarenûsa xwe û heta serxwebûna Kurdistanê jî diyar bikin. Wekî aborînas û stratejîstek, ew bawer dikir ku di cîhana îroyîn de, yekîneyên mezin ên aborî şansek çêtir heye ku pêşbaziyê bikin û pêş bikevin. Ji ber vê sedemê, di pirtûka xwe ya bi navê Kurdistan û Kurd de ku di sala 1963an de hatiye weşandin, wî pêşniyara avakirina konfederasyonek welatên Rojhilata Navîn, bi endametiya Federasyona Kurdistanê, kir. Vê konfederasyonê modelek mîna Yekîtiya Ewropayê xeyal dikir. Li gorî vê yekê, Qasimlo modela "xweseriya demokratîk" di çarçoveyek avahiyek federal de parast. Wî tekez kir ku çareseriya pirsgirêka Kurd li Îranê ew e ku avahiya siyasî ya welêt li ser bingeha demokrasiya pirneteweyî û dabeşkirina dadperwer a desthilatdariyê ji nû ve were avakirin.

Yek ji destpêşxeriyên stratejîk ên Dr. Qasimlo navneteweyîkirina pirsgirêka Kurd bû. Wî hewl da ku pirsgirêkê ji asta pevçûnek çekdarî ya herêmî bigihîne astek bilindtir, di çarçoveya mafên mirovan, demokrasiyê û edaleta navneteweyî de. Bi referansa rêxistinên navneteweyî yên wekî Neteweyên Yekbûyî, Parlamentoya Ewropayê û saziyên mafên mirovan, û her weha bi rêya diyalogê bi rewşenbîr û siyasetmedarên cîhanî re, Qasimlo hewl da ku pirsgirêka Kurd veguherîne mijarek rewa û çalak li ser qada cîhanî.

Van hewldanan di dawiya salên 1980-an de encam dan, û Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê wekî endamek Enternasyonala Sosyalîst hate pejirandin. Qasimlo bawer dikir ku tevgera rizgariya Kurd ji bo pêşkeftin û gihîştina armancên xwe hewceyê sermayeya civakî ya navneteweyî ye. Bi dîtina wî, çareseriya pirsgirêka Kurd bi berjewendiyên hêzên mezin ve girêdayî ye, û ji ber vê sedemê, wî banga konferansek navneteweyî li ser pirsgirêka Kurd kir. Di encama vê nêzîkatiyê de, Qasimlo û Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di navendên navneteweyî de wekî mînakên tevgereke neteweyîdemokratîk a pêşverû hatin bilindkirin. Gelek analîstên navneteweyî, bi taybetî li Almanya, Fransa û Awistiryayê, Qasimlo wekî "pêxemberê Aşîtiyê" bi nav kirin.

## Nerîna



**“Mustafa Hicirî”:**

**“Em hewldana parlementoya Belçîkayê ya ji bo danîna Spaha Pasdaran li ser lîsteya terorê wekî gaveke girîng ber bi eşkerekirina rûyê rastîn ê Komara Îslamî û baskê wê yê tepeserker û dijîgel ve dibînin û piştgirî dikin.i dewlemenkirina uranyumê berde”**



**“ Cemîl Bayik”:**

**“Dewleta Tirk mijarê tenê wekî “çekdanîna PKKyê” dibîne lê pirsgirêka bingehîn guhertina hişmendî û yasayan e ku rê li ber şer vedikin”**



**“Mezlûm Ebdî ”:**

**“Em salvegera Şoreşa 19ê Tîrmehê ku di rêya serkeftina Şoreşa Sûriyeyê de qonaxeke diyarker bû li gelê xwe û li şervanên jin û mêr ên Hêzên Sûriyeya Demokratîk pîroz dikin”**




**“Jad’un Sa’ir” :**

**“ Ehmed Şera piştgirîya cîhadîstên êrîşkar dike û li Sûrîyeya wî Kurd an Durzî pir metirsiye”**

# Kolonyalîzma Navxweyî û Nijadperestiya Sîstmatîk: Dengê Dr. Qasimlû li dijî Faşîzma Farsî



**N. Eskender Ceiferî**



Di dîroka têkoşîna neteweya Kurd de li Rojhilatê Kurdistanê, navê Dr. Ebdulrehman Qasimlo mîna alayek bilind dibiriqe, Rewşenbîrekî şoreşgêr ku berevajî hin kesatiyên din ên siyasî, bi eşkereyî rastiya tal a Îrana navendgera eşkere kir.

Li gor baweriya Dr. Qasimlo “pirsgirêka dagirkariya Kurdistanê” ne pirsgirêkek çandî û êtnîkî ye, lê encamek rasterast a hêjmûniya siyasî, aborî û çandî ya neteweyekê li ser neteweyên din di nav sînorên erdnîgarî yên Îran de ye. Wî, desthilata serdest a li Îranê wekî “faşîzma Farsî” bi nav kir ku hewl dide neteweyên ne-Farsî, nemaze neteweya Kurd, tune bike.

Li gor raman û nêrîna Dr. Qasimlo, Îran ji hêla neteweyekê ve hatiye dagirkirin. Wî gelek caran tekez kiribû ku Îran “welatek pirnetewî” ye, lê hêza siyasî, aborî û leşkerî tenê di destên neteweyekê de kom bûye. Ew jî neteweya Fars e. Bi dîtina wî, ev kombûna hêzê ji bilî kolonyalîzma navxweyî tiştek din nîn e: “Kurdistan koloniyeke Îranê ye. Em di ti hevkêşeyeke vê hêzê de beşdar nîn in, lê di bin pêlavên wê de ne. Tiştê ku li Tehranê tê biryardan, dê di encamê de zindan, tunekirin û mirinê bide me.”

Wî bawer dikir ku “serweriya netewî ya Îranê” efsaneyek e, Belgeya hêjmûniyeke nijadperest e ku hewl dide bêje ku neteweyên ne-Fars bê kok û bê nasname ne û tiştek wan tune ye. Ev serwerî ne li ser peymanek civakî hatiye damezrandin, lê bi darê zorê, tepisandin û çewsandinê hatiye avakirin.

Di salên destpêkê yên têkoşînê de, Dr. Qasimlo xweserî û pergalek mîna fêderalîzmê ji bo Îranê dixwast. Lê bi derbasbûna demê re û çavdêriya xwezaya dagirkar a rêjîmên li pey hev - ji Pehlewî bigire heya Komara Îslamî - ew gihîşt wê encamê ku her hêviyek ji bo rêforma dagirkar a navxweyî li Îranê xeyalek metirsîdar e: Azadî tenê bi serxwebûnê dikare were bidestxistin.”

Wî bi eşkereyî diyar kir ku neteweya Kurd, mîna her neteweyek din a bindest, xwedî maf e ku çarenûsa xwe diyar bike. Bi dîtina Qasimlo, mafê serxwebûnê mafek pir girîng û înkarnekirî ye ku divê her neteweyekê ew maf hebe. Wî serxwebûn ne wek sloganek hestyar, lê wek rêyek maqûl ji bo rizgarbûn ji bêrêzîkirin û wêrankirinê didît.

Piştî şoreşa neteweyên Îranê, Kurdan daxwaza xwerêveberiya dêmokratîk “Xudmuxtarî” yê dikir. Lêbelê, bersiva hikûmetê tepeserkirina hovane, bombebarankirina bajar û gundan, darvekirinên bi kom yên çalakvanan û komkujiya sivîlan bû.

Qasimlo van bûyeran ne wek krîzek navxweyî, lê wek “şerekî ku ji hêla neteweya Fars ve li ser neteweya Kurd hatiye ferzkirin” bi nav dike. “Em neçar mane ku guh bidin hikûmetekê ku ne me nas dike û ne jî me wekî Kurd qebûl dike.”

**Li gor Dr. Qasimlo Komara Îslamî heman polîtîkayên neteweperestiya radîkal a Pehlewî bi guhertina zimanê îdêolojiyê didomîne, Ji nijadperestiya Aryan bigire heya nijadperestiya olî-Farsî.**

Nijadperestiya sîstmatîk li Îranê di hemî astan de tê dîtin. Dr. Qasimlo bi berdewamî diyar kiriye ku ziman, perwerde, mêdya û pergala rêveberiyê, amûrên sereke yên kolonyalîzma navxweyî ya Farsî li dijî neteweya Kurd in. “Mafê me tune ye ku em zimanê xwe yê dayikê jî fêr bibin, zarokên me dîroka xwe li dibistanan naxwînin. Ew dîroka dijmin fêr dibin.”

Sîstma perwerdehî û mêdyayê ya li Îranê an Kurdan paşguh dike an jî wan wekî “çete”, “mirovên hov” û “eşîrên nesivîl” nîşan dide. Ev nijadperestiya nerm, digel tundûtûjiyê, bûne sedema hewldanên ji bo jinavbirina nasnameyê û tunekirina fîzîkî.

Sala 1989an, Qasimlo li Viyanayê, li paytexta welatê Avusturya “Otrîş” ê, di dema danûstandinan de bi nûnerên rêjîma Îranê re hate têrorkirin. Ew têror, ne bi helkeft bû. Berevajî vê, ew beşek ji projeyekê bû ji bo bêdengkirina dengê berxwedana pêşketî ya Kurdan. Dr. Qasimlo hate têrorkirin ji ber ku wî red kir ku neteweya xwe bifroşe.


Terorkirina Dr. Qasimlo xuya kir ku rêjîma Îranê ne amade ye ku heya dawiyê di vê qada aştiyê ya derewîn de berdewam be ku bixwe pêk tîne. Wî her weha nîşan da ku heya ku nasnameya neteweya Kurd zindî be, navend dê her gav bijardeyeke leşkerî bi kar bîne neku diyalogê.

Qasimlo bi xwîna xwe rastiyeke dîrokî zelal kir. Ew jî ev e ku, Îran ne welatek e. Berevajî vê, ew komek neteweyên bindest in ku zû an dereng dê bêdengiya dîlgirtina navxweyî bişkînin.

Îro, neteweya Kurd, piştî sedan salan berxwedanê, ji her demê bêtir haydar e ku azadî ji Tehranê nayê. Berevajî vê, ew ji axa Kurdistanê, çiyayên wê, zimanê wê yê dayikê û bîra wê ya tepeserkirî tê.

Li gorî nêrîna Qasimlo, serxwebûn ne tenê gengaz e, lê pêdivî û pêwîst e. Ji ber ku neteweyek ku nikaribe çarenûsa xwe diyar bike, dê her gav bibe lîstika xelkê din.

# Şehîd Qasimloyê, Ku Min Naskir



N. Mesûd Tek



Ez dixwazim di vê nivisarê xwe da behsa Qasimloyê mirov û Qasimloyê siyasetmedar û qasimloyê, ku min naskiriye û dersên, ku ez ji xebata wî fêr bûme, bikim.

Min navê Qasimloyê nemir di salen 70'î de bihîst. Hingê li Bakurê Kurdistanê hişyariyekê netewî ya berfireh di nava xortên Kurdan de hebû. Di behs û gengeşiya me de navê Qasımlo jî dihat gotin. Lê bi nêzîkî di salen 80'î de min ew naskir.

Tê zanin di sala 1980'an de li Tirkiyê Kudutaya leşkerî çêbû û gelek welatparêz mecbûr man an biçin Rojhilatê Kurdistanê, an jî Rojavayê Kurdistanê , ku ez jî li gel gelek hevalên xwe çûme Rojhilatê Kurdistanê.

Hingê Piraniya axa Kurdistana Îranê hatibû rizgar kirin û ji aliyê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê (PDK-Î) ve dihat bi rêva birinê. Hizb himbêza xwe ne tenê bo me, bo hemû tekoşerên Kurd, ku ji ber rejîma leşkerî pena înabûn Kurdistana Îranê vekir.

Ji salên 1981`an vir ve ji ber kar û baran me gelek caran serdana Polît Buroya PDK-Î dikir û carna jî Şehîd Qasimlo jî didît û li gel wî giftûgo û sohbet dikir.

Nasname û siyaseta giştî PDK-Î ya îro, berhema xebata Qasimloyê nemîr e. Wekî eyan e PDK-Î paş ruxana Komara Kurdistan û şehîd kirina Pêşava Qazî û hevalên wî tuşî qeyrana nasnameyî bibû.

Gelo PDK-Î beşekê partiya TUDEH ye, an jî Partiya Demokrat a Kurdistan (Başur) e? Di encama kar û xebata Qasimlo û hevalen wî de, PDK-Î bûye partiyekê serbixwe û Kurdistanî. Anku nasnameya zelal bo her rêxistinên siyasî mercê serekî ye.

Dersên dinê, ku ez ji Qasimloyê nemîr fêr bûme parastina îxtiyara biryara siyasî dayin e. Zirofê navçe û Kurdistanê, li partiyen Kurd, bi taybetî li partiyên ku xebata çekdarî dikin ferz dike, ku peywendî bi dewletên cîran a dagirker deynin. Ev yeka hanê tiştekê siruştî ye. Lê, tiştek, ku ne siruştî ev ye, ku partiyan îxtiyara biryar dayinê bidine destê biyanî û bi gor daxwaza wan tevbigerin.

Şehîd Qasimlo derheqa babeta hanê da digot:

**"Neyarek ku îro alîkariya te dikin, her dijmin e dost hene, îro alîkariya te nekin jî, her dost in."**

Qasimloyê şehîd hertim digot "partiyên Kurdistanê dikarin li gel dewletên cîran a dagirker, peywendî deynin, lê belê nabe baca peywendiya hanê tevgera azadîxwaza vê perçeyê bide."

Şehîd Qasimlo gelek girîngî dida piştgiriya navnetewî û gelek hewl da, ku hêzên demokrat û azadîxwazên cîhanê palpiştî tevgera azadîxwaza Kurd bin.

**Di her derfetekê de digot "dijminek pir e, hezar dost kêm e."Digot "divê em hewl bidin neyarên xwe kêm bikin, dostên xwe zêde, ger dost nebin jî, bila bê teref bin an jî nebine neyarê tund."**

Dersek, ku ez ji şehîd Qasimlo hîn bûm, derheqa demokrasiyê bû. Hingê ez sosyalîstê tund bûm. Dîktatoryaya proleterya li ba me ji demokrasiyê herî kamîl û pêşketî baştir bû.

Lê belê, gava Şehîd Qasimlo digot "demokrasiya xirab ji dîktatoryaya baş çêtir e", di destpêkê de min qebûl nedikir û digot çawa tiştê usa dibe? Lê belê, ez hêdî hedî têgihiştim û xebat û dîrok jî nîşan daye, ku şehîd Qasimlo rast e û divê xebat bona demokrasiyê bibe stûnek ji bona xebata azadî û serbestî ye.

Ligel vê yekê Qasimloyê nemîr hertim bo me digot "belê rast e îro li Tirkiyê kuduta hatiye çêkirin rejîmê leşkerî heye. Lê belê, anegorî Îran Tirkiyê welatekî demokratîk e, berê Tirkiyê li Rojava ye, Tirkiyê dixwaze bibe endama Yekitiya Ewropa.

Ev yeka hanê bona tevgera Kurd li Bakurê Kurdistanê derfet e. Divê tevgera Kurd ji tund û tijiyê dûr be, girîngî bide xebata demokrasî û dîplomasiyê li Ewropa.

Li ba Qasimloyê şehîd hevkarî û diyaloga partiyên seranserê Kurdistanê gelek girîng bû. Lê belê, ev her usa bi tundî dijî vê yekê bû, ku parçeyek tedaxulê kar û barên perçeyên dinê bike û xwe li ser parçeyên dinê bisepîne. Qasimloyê nemîr digot "em hemû ne dostê hevdu ne, em hemû birayê yekdu ne. Meriv dostê xwe hildibijere lê belê nikare birayên xwe hilbijêre."

Qasimlo gelek caran ji bê dengiya bîrûrayê navnetewî aciz dibû gazinde dikir û digot "du dostên me hene: Gelê me û çiyayên me."

Lê, Qasimloyê nemîr her usa di warê navnetewî da bona peyda kirina dost û alîkar bo xebata azadiyê, gelek kar kiriye. Îro eger gelek karbidestên dewletên Rojava, serokên partiyên desthilatdar dibêjin,"ne tenê çiya em jî dostê Kurd in". Bê guman bandora xebata Qasimloyê nemîr di gotina hanê mezin e.

Şehîd Qasimlo hertim digot em şer naxwazin, dixwazin pirsa Kurd bi şiklê aşitî û bi rêka diyalogê were çareser kirin. Evê dewlet e, ku bi tank û top êrîşî ser gelê Kurd dike û şerfiroş e. Gelê Kurd bona parastina hebûna xwe, bona parastina welatê xwe mecbûr maye şer bike.

Qasimloyê nemîr digot: giftûgo li gel rejîm beşekê girîng a xebata azadiyê ye, mêzê giftûgo jî yek ji meydanên xebatê ye.

Di akamê de pirs, li ser mêzê giftûgo tê çareser kirin, û bi xwe jî li ser mêzê giftûgo hat şehîd kirin, ku ev yeka hanê nîşan dide, ku Qasimloyê nemîr çiqas li ser boçûnên xwe pêgîr e. Şehîd Qasimlo li ser bîrûbaweriya çiqas pêgîr bû evqas jî ji tundrewiyê dûr bû, ev sazişkar nebû sazgar bû.

Bi gor min li gel ew hemû xisusiyetên xwe ve, Qasimloyê nemîr wekî me mîrov bû. Ustureyî nebû ji ezmanê nehatibû. Yên ku gelek bandor li ser min kir, xakî bûna Qasimlo bû. Qasimloyê nemîr yarîker bû, henek dikir. Rugeş bû, min her tim wî bi rukenî didît. Ji xwe nîşan dayîn (show) dûr bû.

Qasimloyê şehîd li esmanê Kurdistanê qertalê berz firîn e û dê her usa jî bimîne.

# Partiya Sosyalîst a Kurdistanê “PSK” jî li salvegera Şehîdkirina Dr. Qasimlo Peyamek belav kir

Di destpêka peyama PSK ê de hatiye: 36 sal berê niha, rêberekî zana û tekoşerê Kurd, Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat, Dr. Qasimlo digel hevalên xwe, li ser maseyê gotubejê, bi destê rejîma xwînxwar a Cumhuriyeta İslamî ya Îranê ve hat şehîd kirinê.

Armanca axundên kevnepererest ji şehîd kirina Dr. Qasimlo, pêşîgirtin li xebata azadiya Rojhilatê Kurdistan û tekoşina Hizba Dêmokrat bû, va dizanî, ku paş şehîd kirina Qasimlo bizava neteweyî têkdiçe û berbelav dibe.

Dîrok şahîdê vê yêkê ye, ku kadr û peşmerge û rêvebirên Hizba Dêmokrat çepera şehîdan vala nehiştin û alayê xebat û berxwedanê bilind ragirtin.

Şehîd Dr. Qasimlo, her wisa mamostayê xebata demokrasî û diplomasiyê bû.

Di rewşa siyasiya nu a Rojhilata Navîn da, em pirtir hewcedarê rênhamayiyên Şehîd Dr. Qasimlo ne di vê warê da.

Em piştrast in, ku neviyên Pêşava, Qasimlo û Şerefkendî, li jêr ronahiya rênimûniyên Şehîd Dr. Qasimlo xebata xwe bi hêztir dikin, per û baskên rejima axundan li Rojhilatê Kurdistana dişkênin û welatê xwe azad dikin û bi wî awayî tola Dr. Qasimlo û hemu şehîdên rêka azadiyê ji rejîma Cumhuriyeta Îslamiya Îranê vedikin.




Em carekî dinê li hember Dr. Qasimlo û hemu şehîdên Kurdistanê, ku bi xwîna xwe ve dara azadiyê şîntir kirine, bejna xw ditewînin.

**Ruhê Dr. Qasimlo û hevalên wî şad û rêbaza wan berdewam be.**

**PSK- Partiya Sosyalîst a Kurdistanê**

# Peyama Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) li Bakûrê Kurdistanê bi hilkevta salvegera şehîdbûna Dr. Qasimlo




## Em Dr. Abdurahman Qasimlo Bi Rêzdarî Bi Bîr Tînin

Di parek ji peyama Partiya Welatparêzên Kurdistanê de hatiye: Dr. Abdurahman Qasimlo û hevalên xwe gava civîna goftûgoyan ya bi dîplomatên Dewleta Îranê re lidardixistin, ji alîyê terorîstên Dewleta Îranê ve tûşî vê komployê bûn.

Dr. Abdurahman Qasimlo, sîyasetmedar, rewşenbîr û dîplomatekî welatperwer bû.

Dr. Abdurahman Qasimlo herweha pêşmerge, fermandar û rêberekî bi tecrube û hêja bû ku, ne tenê ji kîsê PDKÎyê çû, belku ji kîsê hemû Kurd û Kurdistanîyên cîhanê çû.

Dewleta Îranê berîya qetil kirina Qazî Muhammed, Dr. Abdurahman Qasimlo û Dr.Sadiq Şerefkendî jî, piştî wan jî gelek caran bi rêyên komplo û kuştinan xwestîye têkoşîna azadîya gelê me ya li Rojhilatê Kurdistanê bifetisîne.

Lê belê tu komplo û qetlîaman nikaribûye rê li ber têkoşîna azadîya gelê me bigire.

Dr. Abdurahman Qasimlo û hemû şehîdên Kurdistanê, di têkoşîna hemû şervanên qehreman û kedkarên doza azadîyê de dijîn.

Di 36emîn salvegera şehadeta wan de em Dr. Abdurahman Qasimlo û hevalên wî bi giramî bibîr tînin û bi vê minasebetê careke din jî em Dewleta Îranê rûreş dikin.

# Daxuyaniya hevbeş derheq pêla nû ya tepeserkirinê li Îran û Kurdistanê

**Ji bo raya giştî ya cîhanê**

Piştî şerê 12 rojî yê di navbera Îran û Îsraîlê û ragihandina agirbestê, pêlek nû û berfireh ya tepeserkirinê ji riya girtin, bidûkeftin, îdaman li Kurdistan û deverên din ên Îranê ji aliyê Komara Îslamî ve dest pê kiriye. Dezgehên ewlehiyê yên rejîmê ji riya tometên nerewa, çêkirina dosyeyên sexte û darizandina girtiyên siyasî, û herweha bi nirxandina yasaya sîxuriyê li parleman û dezgeha dadweriya rejîmê, rewşek metirsîdar ji bo girtiyên siyasî û rexnegirên hikûmetê afirandine. Li gorî raporan, hejmara destbiserkiriyan heta niha ji Hezar kesan derbas bûye û rêjeya darvekirina girtiyên siyasî zêde û berdewam dike.

Çend roj berî niha bû ku Îdrîs Alî, Azad Şucaî û Resûl Ehmed, sê kolberên Kurd ku bi tometa hevkariya bi Îsraîlê re hatibûn tometbarkirin, hatin darvekirin û niha jiyana çend girtiyên din ên Kurd ji Bokanê ku sê salan berî niha li şoreşa Jîna'yê de hatibûn girtin û cezayê îdamê bi ser wan de hatiye sepandin, li metirsiyê de ye.

Komara Îslamî ya Îranê her gava di şerekî derekî yan pirsekî navdewletî de tûşî şikestê hatibe, tola xwe ji tevgera mafxwaziya xelkê di hundurê welêt de standiye û niha jî dixwaze tola torandina xwe di şerê Îsraîlê de ji civaka sivîl, tevgera mafxwaziya gelên Îranê û girtiyên bêberevan bistîne. Bê guman, eger Komara Îslamî hest bi givaş û bertekên bihêz ên navxweyî û derekî neke, dûr nine trajediya komkujiya girtiyên siyasî di girtigehên Îranê de dubare bibe, wekî ewa ku di sala 1988an de piştî pejrandina agirbesta digel Iraqê piştî 8 salan şerê bêencam, bi hezaran girtiyên siyasî di welat de kuştin.

Em tevî nîşandana nîgeraniyên xwe li dor ew metirsiyên ku gefê li çalakvanên siyasî û sivîl, bi taybetî jiyana girtiyên siyasî dike, daxwaz ji:

- Birêz ''May Sato'' rêportera taybet a Neteweyên Yekbûyî ji bo karûbarên mirovî li Îranê
- Navendên navneteweyî ên Berevnakar ên mafên mirovan
- Hemû xelkê azadîxwaz ên cîhanê, Dikin ku bi her awayî ku dikarin dengê xwe li dijî vê siyaseta nemirovane bilind bikin û rê nedin ku Komara Îslamî bê tirs û xem bikeve canê wan xebatkarên ku ji bilî mafxwazî, azadîxwazî, û xebat ji bo başkirina rewşa jiyana xwe û mafên siyasî, sivîl û neteweyî ên xwe ti gunehek nebûne.




Em bang li part û rêxistinên siyasî yên Îranê, saziyan, Îraniyên azadîxwaz û Kurdên diyasporayê dikin ku bi hevdengî, çalakî û aksiyon û civînên xwe, dengê nerazîbûn û bêzariya xwe li dijî vê siyaseta tepeserkar bilind bikin. Bêguman hesta hevsozî û piştgiriya ji bo girtiyên siyasî di nav civatên xelkê Îranê de pir bihêz û xurt e û ev nerazîbûna giştî û tevalî a cîhanî dê ji bo hereket û tevgerek seranserî û Kurdistanî li pêşerojê de xweş û geş bike.

Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê-PJAK
Partiya Azadiya Kurdistanê - PAK
Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê (PDKÎ)
Komeleya Şoreşger a Zehmetkeşên Kurdistana Îranê
Sazmana Xebat ya Kurdistana Îranê
Komeleya Zehmetkeşên Kurdistanê
Komele- Rêxistina Kurdistanî ya Partiya Kumonîst a Îranê

**9ê Tîrmeha 2025'an a Zayînî**

# Li 36emîn salvegera terorkirina Dr. Qasimlo de 10 rêkxiravên mafê mirovî daxuyaniyek belav kirin




Roja 22ê Pûşpera 1404 a Rojî, li 36emîn salvegera terorkirina rêberê zanayê Kurd "Dr. Ebdulrehman Qasimlo" de 10 rêkxiravên mafê mirovî bi belavkirina daxuyaniyekê ragiahndin: Dema vê hatiye ku parastîbûna rêjîma Îslamiya Îranê bê şikandin û rêkarên navnetewî bêne bikaranîn.

Wan rêkxiravan li vê daxuyaniyê de tevî bilindragirtina yad qurbaniyên vê terorê, daxwaza hewldana lezgîn, yasayî û navnetewî bi armanca dawîanîn bi parastîbûna eşkere ya rêjîma Îslamiya Îranê li pirsên terorê de kirine.

Li vê daxiyaniyê de hatiye ragihandin ku terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî pêka yasayên navnetewî, nakeve nav warê derbasbûna demê û heta dema ku sedemên vê terorkirinê, piştevanîkirina hikûmî hebe û parastî bin, tawan bi dawî nehatiye û dibe lipeyketin bo bê kirin.

Li beşeke vê daxuyaniyê de hatiye: "Otrîş wek cihê encamdana vê kiryara terorîstî, tevî hebûna belgeyên zaf, kesên cihê gumanê ên bikerê vê tawanê vegerandine Têhranê, ev hewla, binpêkirina eşkere ya biryarnameyên Otrîşê pêka belgeyên dijeterorê, binyatên rêgirêkirin li bidarvekirinên xoserane û beşên "6, 13 û 14" ên peymannameya mafên yasayî û medenî ye.

Wan 10 rêkxirav, terorkirina "Dr. Qasimlo" li bajarê Viyenê, bi pêvajoya rêkxisinkirî ya jinavbirina cudabîran li derveyî Îranê binav kirine û ragihandine ku bêdengî û encamnedana ti karek ji aliyê dewleta Otrîşê û civaka cîhanî ve, ev peyama da komara îslamî ku terorkirin li axa Ewropayê de ti nirxdanek bo wan nîne.

Li dawiyê de daxwaza, çalakkirina lezgîn a mikanîzma navnetewî bo lipeyketin bo bikerên vê terorê ye, da ku ev dosye vegerê ser rêya dadperwerane.

Ev 10 rêkxirav, ev in: "Damezraweya Ebdulrehman Burûmend, Navenda Bergirîkerên Mafê Mirovî, Navenda Belgeyên Mafê Mirovî li Îranê, Rêkxirava Mafê Mirov li Îranê, Komeleya Mafê Mirovî ya Kurdistan-Jinêv, Tora Mafê Mirovî ya Kurdistanê, Girûpa mafê Mirovî ya Belûçistanê, Resanek, Rêkxirava Mafê Mirovî ya Ehwazê û Rêkxisrava Mafê Mirovî ya Kurdpayê.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Binçavkirina welatiyên Kurd berdewam e




Hêzên îtilaat rêjîmê roja Sêşemî 24ê Pûşperê li bakûrê Xurasanê de li bajarê Bucnûrdê, bi awayê xoserane û bê belgeya yasayî, bi êrîşkirina bo ser mala welatiyê Kurd “Araz Salihî”, hewla binçavkirina keça wî ya helbetswan a bi navê “Kejal Salihî” yê dabûn lê ew bi barimte girtine ku keça wî ya 14 salî ku helbestek welatperwerî strandiye, xwe radestî hêzên îtilaata rêjîmê bike.

Herwisa “Fuad Mihemedî”, xelkê bajarê Sinê li 23ê Pûşperê û “Sebah Emîniyan”, xelkê bajarê Bokanê li 22ê Pûşperê û “Hamid Şamî” xelkê bajarê Pîranşarê li 19ê Pûşperê” li êrîşkirinên xoserane û neyasayî yên hêzên hov ên îtilaat rêjîmê, hatine girtin û bo cihek nexuya hatine veguhastin.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê qedera wan welatiyên Kurd her bi nerohnî maye.

## Rêjîma Îranê li sînorî Hencîranê kolberek kuştin



Hêzên hov ên sînoriya rêjîmê li bajarê Merîwanê li Sînorê Hencîranê de li roja 24ê Pûşperê, bê agehdarkirina berê û bi awayê rasterast teqe li kolkberek ê bi navê “Peyam Ehmedî” kirin ku li encama vê kirayara hova ne de, ew kolber hatiye kuştin.

“Peyam Ehmedî”, bavê zarokî û xelkê gundê “Ber Qurû”yê ser bi bajarê “Sewlawa”yê ye û termê wî kolberî rojek piştî kuştina wî, hatiye peydakirin.

Pêka raporên belavbûyî, termî wî kolberî li nexweşxaneya bajarê Merîwanê de hatiye ragirtin û biryar e ku termê wî li gundê wî de bi axê bê spartin.

## Binçavkirinên xoserane a welatiyan ji aliyê rêjîmê ve berdewame



Pêka raporên Saziyên Mafê mirovî roja Şemî 21ê Pûşperê Welatiyekî xelkê gundê Deşbend yê ser bi bajarê Bokanê, bi navê Îsmaîl Çûkelî, temen 24 salî, ji aliyê hêzên ewlehî yên rejîmê ve hate binçavkirin.

Herwisa Kamran Ruwaz û Mensûr Rehîmî çalakvanê civakî û wênegirê Kurd yên xelkê bajarê Mehabadê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine girtin.

Li roja Pêncşemî 19ê Pûşperê “Zubeyîr Mehmûdî” temen 32 salî, xelkê bajarê Pîranşarê, piştî êrîşkirina hêzên rejîmê bo ser mala navbirî bi bê hebûna belgeyên yasayî hatiye girtin.

Li vê rojê de Ezîz Xizrî, welatiyê Kurd ê xelkê Pîranşarê û kurê wî yê bi navê Zanyar Xizrî ji aliyê hêzên ewlehî yên rejîma Îranê ve hatine girtin.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê, ji sedema girtin, tohmetên sepandî û cihê ragirtina wan welatiyên Kurd ti zanyariyek serast li ber dest nîne.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (498)





**Bîranîna Xebat Û Tekoşîna Rêberê Neteweyî Yê Kurd**

## Simko'yê Şikak 1887 _ 1930

Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê
Navenda Ragihandinê